

KOMELEY XWENDIKARANI KURD LE EWRUPA

K S S E
G/O Asad P.F.301503 (Kurdish Students' Society in Europe)
1000 Berlin 30

REWSÛ ZINETA KURDISTANA TURKIYÊ

"Miletêkî Asad Miletêkî din Berdest nake"
K A R L M A R X



Xwendevanên Hêja!

Careke din bi sedan ji Welatperwerên Kurd li Kurdistana Turkiyê têtin girtin û bi dirindî têtin avêtin binê bend û zindanan. Bi sedan têtin dan beramberî dadgehên Leşkerî. Careke din Sêpî ji bona Qehremanên Welatê me li Kurdistana têtin hildan. Careke din li seranserî Welatê dibe şûn û girî. Serdarên Toraniyê dev bi xwîn, weha bawer dikin bi kuştin, bend û zindan û darvekirinê dê Lêberxwe-dan û Vîna Miletê me bikin û her û her dê Dewlemendbûna Welatê me talan bikin û hêjî bi serdeji Tevayê Xelkên Kurdistana Bende û Kole bikin.

Di vî Sedsalê me de, Sedsalê guhertinê ji Sermiyandaryê ber bi Sosyaliyê, di vî sedsalê me de, Sedsalên Bistan de, ku bi rastî bigirî tevaya Sustêma Kolonyaliyê li seranserî Cihanê bi saya Şûreşa Oktoberî Mezîm di sala 1917 de dest bi ketina xwe kir û di salê Şêstî de hate herifandin. Bêtir ji 156 Dewlet neha ew Endamên di Yekitiya Netewan de, Lê hêjî Miletê Kurd ji sala 1914 de li seranserî Kurdistana xwe di tariya sedsalên navîn de dijî, di bin Sustêma Kolonyaliyê û Bendîyê de. Di Rojhilata Navîn de ew ne bes bê Pîşk û Pare ji Dewlemendbûna Welatê xwe, lê belê hêjî bi serdeji mîna Kole û Bendan di bin Destên Karbedestên Bêganede dijî.

Li Kurdistana Turkiyê, ji sala 1933 de Rêjîma Turkiyê Toranî bi Resmî daye zanin: Kurd li Turkiyê yek Mafê wan heye, ewjî bes û bi tenha Bende û Kole bin.

Di sala 1937 de li ser Çiya Eraratê bi bilindbûna 15 mitir bi Tîpên Latîniyê gere bi Turki Dewleta Toranî nivisandîye: Vê derê Goristana Kurdistana ye. Ji vê demê û pêve Xelkên Kurd li Kurdistana Turkiyê tev bi carekê bûn bes û bi tenha Turken Çiyayî. Li seranserî Turkiyê Kurd neman. Weha bawer dikirin Bêvacên Xwixwarên Toranî, Neviyên Cengîzhan, Holako û Temurleng dê Miletê Kurd ji Kurdistana qirbikin.

Lê demê daxuyanîkirin, ku ew siyaseta çewt û xwar a Dewleta Turkiyê beramberî Xelkên Kurdistana ji sala 1925 de, a li ser bingehê Kuştin, Talanê û Darvekirinê hati-bû danin, rojekê ji rojan Xebat, Vîna û Evîna Welatperwerên me bihekê ranewestand ji bona Azadî, Serxwebûn û xwebûna Jinê. Bi hezaran sed hezaran dane ser wê Rêya Perest, Rêya Şêx Seîdê Pîran, Xalidê Cibîrî, Dr. Fuad û Ixtî, a ji bo wê di sala 1925 de tev li 53 Hevalên xwe li bajarê Amed bi serbilindî hilkişîyan ser textên Sêpiyan; ji bona Dara Azadiya Kurdistana me bi xwîna xweyî pak avbidin.

Cewahir Lal Nehro di Zindanê de, di sala 1936 de, di nameya xwe de ji bona Keça xwe Andêra li ser Kurd û Şûreşên wî dinivîsîne û dawî dibêje: Miletêkî weha ku amade be Buhayê Azadî bi Xwînê bide, Ew Miletaya nayête Şikonandin û wê Ew dâr yan-jî nêşik dê bihê Serxwebûna xwe.

Iro vaye Dem ji Dost û Hevkarên me re bêtir û bêtir dide xuyaniyê kirin, ku Xebata Xelkên Kurdistana li Turkiyê roj bi roj bêtir geş û gûrtir dibe. Bi hezaran sed hezaran ji Xebatvanên Welatperwerên me ji nava Bajar û Gundan deatên xwe vemilandine ji bona xebata Çarekirina Pîrsiyariya Welatê bi herdu Aliyên xwe ve, ê Milî û Civakî. Ev Şiyarbûn û Şêweyê Xebata Cemahîrên Kurdistana li ser Rêça berzkirina Ala Makîsîzîm, Lenîzîm di nava Welatê me de, belê di nava Cerg û Hinavên Cemawerên Kurdistana de, vaye tê lerizandin Serdariya Bêganeyî Toranî, Nokerê Impîryalîzma Emerîkî û pêrejî Hestîkojî, Xwefireşî Kevneperestên Kurd, Borcuwaziya meyf Gen û Genî; ji vê Şiyarbûna Cemahîrên Kurdistana me li ser bingehê Markîsîzîm, Lenîzîm, Cihanbîna Zanîstî, a Karker û Cotkarên Cihanê.

Ne bes tenê vaye Kurdistana bîye Zindan, her wehaji pêrejî tevaya Turkiyê bi xwe. Generalên wê, ên hatin ser Deshilatiya wê di sala 1980 de bi darên Zorê, Nokerên Impîryalîzma Emerîkî tevaya Welatê kirine Zindanêke Teng û Tar ji bona Hemû Xelkên Turkiyê. Mafeyê Mîrovan roj bi roj bi ling û piyan pê tê lêkirin, bes û bi tenha ji bona Qazanc û Berjewendiya Impîryalîzma Emerîkî, Dujminê Mîrovanyê li vê Cihanê. Bes û bi tenha bêtir ji 32 Wargehên Leşkerî, ên biçûk û mezîni Emerîkî li nava Kurdistana bi xwe me. Ev Wargehên Cengîn me bes dijî Miletê Kurd, dijî Miletê Turk û Komanîyên Milîyî din, dijî Hêzên Pêşverû û Demokrasî li Rojhilata navîn, lê belê ji dijî Dewletên Sosyaliştî û nemaze dijî Dewleta Sovyetîstanê bi xwe me. Welatê

me li gora Biryara Nato di sala 1964 de, ci gava bibe Ceng li gel Welatên Sosyali-
ti, dê wê çaxê Kurdîstana meyf gepal bi Atoma Zerî bête Bombarkirin; ji bona pêkanîna
Kembera Atomîfî Şîn, ku têre nema bikaribe Leqkerê Sorî Sovyêt derbasbibin. Belê li
ser wêrankirîna Kurdîstana me û kirîna Welatê me mîna Hêroçîna û Nagazakî bes û bi
tenha ji bona berjewendîya Impîryalîzma Emerîkî, da bêtir û bêtir talankirîna Dewle-
mendbûna Rojhilata Navîn bikin û Konê Zalbanq xwe li ser seranserîya Cihana Welatên
li Paqvenayî vedin. Belê Konê Sedsalên Navîn, Konê Bendîtyê û Koletîyê.

Ji ber van Rewş û Zînetên hanê, belê ji ber pêwîstîya Jîn û Mejuwê Miletê Kurd li
Kurîstana Turkiyê Destên xwe ji dil û can dixin nava Destên Demokrat, Pêşverû û Hê-
zên Welatperwerên Turk û Kêmanîyên Milîî din, ku ew tev li gel hev xebatê bikin di
Generalên Toranî; ji ber ew ne bes Dajmînê Miletê Kurdî, lê belê ji ew bi xwe dajmî-
nê hemû Xelkên Turkiyê bi xwe me. Wan Welat kirîna Zindaneke Tenqû Tar ji bona Bas-
tirîna Law û Keçên Turkiyê bi sarokê.

Yeketiya Xebata li gel hev dergeheki mezin ji bona xebata Gelê Kurd vedike ji bona
gihandîna Armancên tevaya Rêniştvanên Turkiyê bi raxandîna vê Rêjîma xwînîrêj û Faşî,
Nokerê Impîryalîzma Emerîkî di Rojhilata Navîn de, ji bona anîna Rejîmekî Demokrasi
û Pêşverû li Turkiyê, ji bona Çarekirîna Pirsîyariya Milîî û Civakî li seranserî Tur-
kiyê û pêkanîna Komêreke Azad û Sorbixwe, a Turk, Kurd û Kêmanîyî Milîyîî din, da têde
roj bi rej Destaniya hemû Gelên li Turkiyê dijî bêtir û bêtir gegbibe. Tev li gel
hev di Agîtîyê û Bextîyariyê de bijîn. Bête hilanîna Konê Sedsalên Navîn ji nava Kur-
dîstana me. Li her der û Cih bête hejandîna Ala Rizgarkirînê ji Sîtema Milîî û Civakî,
bes bi mîne Koletî û Bendîtî di nava Turkiyê de, belê bête hilanîna Çewîsandîna Mî-
rov di rêya Mîrov de. Komara Turkiyê, Komara Turk, Kurd û Kêmanîyî Milîyîî din, ew dibe
wê çaxê nîmêne ji bona Miletên din di Rojhilata Navîn de.

Ji bona gihandîna van Armancên bilind bi Kêntîrîna Gorf û Kurt tîrîna Dem, em bangdi-
kin ji bona hemû Welatperwerên Kurdîstana Turkiyê, Sasmendî û Partîyên wan, ku ew
Destên xwe tev bi hev re têxin nava destên hev ji bona gîr û geşkirîna xebatê dijî
vê Rêjîma xwînîrêjî, xwînîjî Faşî, ji bona bi lez û bez bête herifandîna, da Konê sed-
salên Navîn ji ser Kurdîstana me bête hilanîna û perçe perçe kirîna. Hêviya Şêx Seîd,
Xalîdê Cîbrî, Dr. Fuad, Ixtî bi 53 Hevalên wanre bi saya çûn li ser Rêya Markîsîzîm,
Lenînîzîm di Azadîyê, Serxwebûn û Xwebûna jînê de bête bi cihanîna.

Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa, bang dike ji bona Bîr û Baweriya Cihanê,
ji bona hemû Hêzên Demokrasi, Pêşverû, Azadîxwas û Aştî li seranserî Cihanê, ku ew
dengên xwe bers bikin û tîrebûnê xwe diyar bikin di Rêjîma Generalên Turkiyê, ên
tevaya Welat kirîna Zindan û bi sedan hildidîna ser dar, ji bona bi dawî anîna van
karên dirindane, ku ew bi xwe dijî tevaya Mîrovane li her der û cih li vê Dunya me;
ji ber ev Generalên han bi bê çermî roj bi roj mafeyên Mîrovane li seranserî Turki-
yê dixin bin potînê xwe ji be dilxweşbibin Roland Reagan û Alexander Haig. Û ew
Dewlemendbûna Turkiyê ji bona Kompanîyên Impîryalîzmê bi ersanî pênkeş dikin.
Weha Dewlemendbûna Turkiyê tête Talankirîna û Azadîya Xelkên wê li bal Impîryalîz-
ma Emerîkî tête pê lêkirîna. Tevaya Cemahîrên Turkiyê di Rebenîyê û Perîsaniyê de
dijîn. Bi hezaran sed hezaran Nefer ji Welat têtin avêtin ji bona bazarê Kar li
Welatên Sermiyandar, bes û bi tenha ji bona ew û Zarokên xwe bi karibin bijîn.
Hêsa wanî kar bi ersanî têtin firoştin, bi serdeji li nava Welatên Sermiyandar
li wan Karkeran bi cavên Kole û Bendan tamase dikin.
Weha ji me re bi rast û durustî, belê diyar dibe, ku Miletêkî Azad Miletêkî din
Berdest nake.

Tev li vêjî dê Miletê Kurd bi çûn li ser Rêca Markîsîzîm, Lenînîzîm, dê Kurdis-
tanê bike Vîyetnama Rojhilata Navîn, dê Konê Sedsalên Navîn tarwar bikin, Serdariya
Bêgane di nava Xakê me de dutabikin, Ala Rizgariyê, Serxwebûn û Xwebûna Jînê
bers û bala bikin û bi hilanîna Çewîsandîna Mîrov di Rêya Mîrov dê di seranserîya
Kurdîstanê de û tevaya xebata bi hezaran sed hezaran ji tîkogerên Kurd bi ser
ketîne Tac û Xelat bikin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa (KSSE)

Sikretaryat

23.2.1982